Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1150 | 10-Adar- 2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# ‘Radyo bingeha belavbûna dengê kurdî ye’

Ronahî Sadûn/Qamişlo

**Di serdemên ku hêzên desthilatdar û dagirker ziman û çanda kurdan qedexe kiribûn, radyo bibû bingeha belavbûna dengê kurdî. Rêvebera Radyoya Sewt Elheyat (Dengê Jiyanê) Sozdar Ehmed diyar kir ku xebatên radyoyê bi tecrîbeyên ferdî hatin pêşxistin û her radyoyek bi deng û rengê bajarê xwe pêşketinê dide avakirin.**





Di serdema ku teknolojiya ewqas bandorî li ser têkiliyên mirovan çênekiribû, radyoyên kurdî ji deverên dûr dengê stranbêjên Kurdan di malên Kurdan de dihatin guhdakirin. Radyo bi armancên cuda hatin damezrandin, xwe ji van armancên avakirinê rizgar kirin û bûn sedema belavbûna dengê Kurdî. Herwiha ji ber di demên hêzên dagirker û desthilatdar de nav, ziman û çanda kurdan qedexe bû, tenê radyo bibû cihê bêhnvedana gelê kurd û dihişt ku di nava qedexeyan de bikarin dengê dengbêj xwe bi Kurdî guhdar bikin. Herwiha heta sala 1930`an de ti amûrên radyoyê nehatibû deverên kurdan û yekem amûra radyoyê jî hatiye bajarê Silêmaniyê. Ew radyo li qehwexaneyeke hatibû bicihkirin.

**Kurdan bi riya radyoyê li rewşa welatên xwe guhdar dikirin**

Piştî ku weşanên radyoyên kurdî hatin destpê kirin, kurdan bi taybetî dewlemendên wan dest bi kirîna amûrên radyoyê kirin, ta ku di nav qedexeya ziman, çand û wêjeya Kurdî de bikarin hinekî bêhna kudayetiyê, ber dengê dengbêjan şevbihêrkên xwe bikin. Ji bo wê amûra radyoyê li cihê herî xweş yê malê dihat bicihkirin. Di heman demê de li gundên mezin jî, yek yan du amûrê radyoyê lê dihatin peydakirin, lewra gundî li wan malan her êvar kom dibûn û li radyoyê guhdar dikirin. Û di demên nûçeyan de, mal tijî dibûn ta ku li deng û behsên cîhan û kurdistanê guhdarî bikin. Jixwe ew çandeya ku radyoya bav û kalên me, her radyoya xwe ya biçûk datanî ber guhê xwe û pê dilîst ta ku frekansa rast zeft bike, ji wan serdemên qedexeya tund hatiye ku wan hewl dida dengên kurdên di nav sînoran de dabeşbûyî, bibihîzin û bizanin bê rewşa welatê wan çi ye.

**Yekem Radyoya Kurdî**

Yekem radyoya bi zimanê Kurdî di sala 1923-1929`an de ji Yekîtiya Sovyetê dihat kirin. Amir Hesenpûr di pirtûka xwe‘Netewperwerî û Ziman li Kurdistanê’ de wiha dibêje: “Li gel ku amûrên radyo negihiştibûn Kurdistanê Tirkiye, Îran û Îraqê jî, weşanên yekem ên radyoyê yên bi zimanê Kurdî li herêma Kurdî a xweser a li YKSSyê hatibû damezrandin dest pê kir. Sê radyoyên girîn ku bi zimanê kurdî weşana xwe dikirin lê ne ji aliyê kurdan ve hatibûn vekirin, radyoya Êrîvanê Bexdayê û Qahîrayê bû. Di derbarê rol û bandora radyoyan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêvebera radyoya Sewt Elheyat (Dengê Jiyanê) Sozdar Ehmed ji rojnameya me re axivî.

Sozdar Ehmed diyar kir ku destpêka avakirina radyoyan ji bo gelê kurd girîng bû û wiha got: “Giştî xebatên radyoyan wekî destpêkê ji bo gelê kurd pir girîng bû, bi taybet damezrandina wê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji ber îro roj gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê di nava şoreşekê de derbas dibin, şoreş jî guhertina bi xwe re dide avakirin, mîna di aliyê civakî, aborî û siyasî, bi taybet di aliyê siyasî de dewletên kampîtalîzim xwestin bingeha xwe ya desthilatdariyê li ser gelan pêk bîne. Ji ber gelê Kurd bi salan di nava qirkirinê de maye. Ji bona wê pêwîst bû ku radyo di nava herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bên avakirin. Di heman demê de radyo bibe cihê parastina çanda gel û dengê gel.”

**‘Xebatên radyoyê bi tecrobeyên tekane hatin pêşxistin’**

Sozdar Ehmed di berdewamiya axaftina xwe de da eşkerkirin ku yekem radyo li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dengê Cûdî bû û wiha got: “Radyoya yekem ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi weşanê kir radyoya Denê Cûdî bû, ew jî di sala 2012`an de hat avakirin, lewra çoşa radyoya cûdî ji hemû radyoyên ku piştî wê hatin avakirin zêdetir bû, ji ber karîbû weke radyoya yekem bi zimanê kurdî xwe îfade bike. Ji xwe piştî radyoya Cûdî gelek radyoyên din jî di hundirê herêmê de hatin avakirin. Her radyoyek xweşbûn û zehmetî û taybetmendiyeke wê hebû, ew jî li gorî herêma ku lê weşan dikir. Herwiha radyo di destpêka xebatên xwe li herêmê, rastî hin zehmetiyan dihat, lewra zehmetiya yekem ku hat kişandin, ewbû ku kesên pispor xebatên radyoyê nas bikin kêm bûn. Lê xebatên radyoyê bi pêşetin û tecrobeyên ferdî hatin meşandin. Zehmetiya din jî ku radyo rastî wê dihatin, di aliyê rêziman de bû, ji ber hetanî salên 2021`an de hîna kesên ku karibin nûça bi Kurdî îfade bikin, tinebûn. Lê radyo karîbû zemînekê ji bona Ajans, kenal û hwd bide avakirin, lewra îro kesên cihên xwe di Ragihandinê de digirin, destpêka wan di xebatên radyoyê de bûn, ev jî rola Ragihandinê li pêş xist. “

**‘Radyo pêşketinê dide avakirin’**

Rêvebera Radyoya Sewt Elheyat (Dengê Jiyanê) Sozdar Ehmed axaftina xwe wiha qedand: “Pêşketina xebatên radyoyê, bû sedema ku îro roj bi 10`an radyo li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bên avakirin. Her radyoyek bi deng, reng û taybetmendiya bajarê xwe dixwaze pêşketinê bide avakirin. Dibe ku pêşketinên teknîkî pir bone, li di nava şoreşa ku em îro roj têde derbas dibin û cihên ku ji çeteyên DAIŞ`ê rezgar bûne, hewcedariya wan bi guhdarkirina radyoyan heye, bi taybet malbatên belengaz ên ku televîzyon û enternêt li cem wan peyda nabe, li radyoyan guhdar dikin, em jî xebatkarên radyoyê dibin muxatebên wan û moral ji wan digirin.”

Sudoku: Bersiv 62

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 8 | 2 | 6 | 4 | 5 | 1 | 7 | 3 |
| 7 | 6 | 1 | 9 | 3 | 8 | 5 | 2 | 4 |
| 3 | 5 | 4 | 1 | 7 | 2 | 6 | 8 | 9 |
| 4 | 1 | 7 | 2 | 6 | 3 | 8 | 9 | 5 |
| 2 | 9 | 5 | 4 | 8 | 1 | 7 | 3 | 6 |
| 8 | 3 | 6 | 5 | 9 | 7 | 2 | 4 | 1 |
| 1 | 7 | 8 | 3 | 5 | 4 | 9 | 6 | 2 |
| 5 | 4 | 9 | 7 | 2 | 6 | 3 | 1 | 8 |
| 6 | 2 | 3 | 8 | 1 | 9 | 4 | 5 | 7 |

Sudoku:Pirs 63

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | | | | | | | 5 | 3 |
| | | 5 | | | | 6 | | |
| 2 | | | | 5 | 1 | | | 7 |
| 1 | 3 | | | 8 | 4 | | 9 | |
| | 5 | | | 9 | | | 7 | |
| | 8 | | 6 | 1 | | | 3 | 4 |
| 3 | | | 5 | 2 | | | | 8 |
| | | 8 | | | | 9 | | |
| 4 | 2 | | | | | | | 5 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Avê di conî de dikute:**
- Bi heman wateyê.

**Avdana mêrikê koçer e:**
- Karê xwe dubare dike lê pir bêwate ye; karê bêwate dike. (12)

Axînê, te negirt derê birînê:
- Faydeya axeaxê nîne

**Barê li ser milan e:**
- Ti kar jê nagihe min; bêsûd e.

**Barê li ser baran e:**
- Bi heman wateyê.

**Barê li ser piştê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Barûtê ber qitika ye:**
- Bi tiştên beredayî ve mijûl dibe; karê bêsûd dike.

)Barûte: Teral, serserî, beredayî(

**Barûte ye:**
- Bi heman wateyê.

**Berê avê dane kaş:**
- Karê ku nebe dikin; tişka ku dikin ne berbiaqil e.

**Bi kerê seqet kêrvoşik nayê girtin:**
- Her kar rê û rêbaza wî heye.

**Birin nêçîra jîjoyan:**
- Pir li bendê ma û tiştek jî bi destê wî neket.

**Bixwe dibêje û bixwe tewîniyan dide:**
- Haya ti kesî jê nîne; ew bixwe pesnê xwe dide; ti kes guhê xwe nadiyê, lê dîsa diaxive.

**Bi kulmê diçe dirêjikê:**
- Karên beredayî dike; tiştên bêmentiqî dike.

**Bi moxilê avê dikişîne:**
- Karê bêwate dike; karê ku tiştek bi ser nekeve dike; karê beredayî dike.

**Bîr li devê çeman nayê kolan:**
- Pêwîst nake tu bêjî, jixwe karê min ew e.
- Pêwîst nake ez careke din bikim, min ew kar ceribandiye.

**Cil e ketiye mile:**
- Bi kêrî tiştekî nayê.

Çi li Mûşê, çi li pişt dergûşê:
- Piştî ku sûda wî negihe min, ha li dûr, ha li nêzîk.

**Çiraye û diraye:**
- Êdî bi hev ve nagire; êdî pêşî lê nayê girtin; êdî bi ser hev ve nayê; êdî bi kêr nayê; nahêje ku mirov li pey bikeve; çareser nabe.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



## 8`ê Adarê Sembola Berxwedana jinê ye

Jinên Kurd, Ereb, Suryan û Ermen yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku 8`ê Adarê ji bo wan xwedî wate û girîngiyeke mezin e û wiha gotin; “8`ê Adarê ne bi hesanî ji jinê re bûye rojeke cîhanî, bi berdêlên mezin yên jinên berxwedêr bûye sembola berxwedana jinan û rojeke dîrokî.”**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1150 | 10-Adar- 2024 | www.ronahi.net/ku/

# BÊDENGIYA CPT DEWAMA POLÎTÎKAYÊN QIRKIRINÊ YE

Komîteya Pêşîgirtina li Işkenceyê ya Konseya Ewropayê (CPT) careke din dirûtiya hêz û rêxistinên navneteweyî yên derbarê rewşa Rêber Abdullah Ocalan û Imraliyê de, derdixe holê. CPT ku qaşo ji bo pêşîgirtina li işkenceya mirovan hatiye damezrandin, li hemberî tecrîda girankirî ya li Îmraliyê xwe bêdeng dike, herwiha bi erk û berpirsyartiyên xwe yên exlaqî ranabe. CPT bi vê helwsta xwe piştgiriya dewleta Tirk a faşîst û xizmeta polîtîkaya inkar û qirkirinê yên li dijî gelê Kurd tê meşandin, dike.**R-4**




## Pêşxistina xebatên Şaredariyê valaderxistina armancên DAIŞ`ê ye




Di 11`ê Adara 2014`an de çeteyên DAIŞ`ê êrişek hovane li dijî Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo pêk anî, di encamê de 10 xebatkar û lêvegerên li şaredariyê şehîd bûn. Şahidê buyerê Cemal Xelo diyar kir ku armanca DAIŞ`ê têkbirina destkeftiyên şoreşê bû.**R-5**

## ‘Tevî êrişan jî xebatên embarên genim didome’



Rêveberê embarên genim yên bajarê Qamişlo, Ferhad Zênal anî ziman ku kar û xebatên embarên genim yên ku dikeve xizmeta civakê de, tevî hemû astengiyan jî herdem berdewame.**R-6**



Rêwîtiya ji Clara heya Sarayan e ;8’ê Adarê
Zozan Cızîrî R-2


Hefteya Qehremeniyê
Ahmed Aktaş R-4


Têkoşîna jina Kurd çavkaniya azadiya jinên cîhanê ye
Idrîs Henan R-5

## ‘Gelên Rojhilata Navîn li benda çareseriyê ne’

Sekreterê Partiya Roj a Demokrata Kurd li Sûriyê, Kovan Keni`o anî ser ziman ku tevahiya Rojhilata Navîn di rewşeke bê ewle de derbas dibe. Herwiha Keni`o destnîşan kir ku heta guftûgoyên berfireh di navbera hemû aliyên sûrî de çênebe wê aloziya Sûriyê jî bidome.**R-4**




## Peykersaz Rêşan Yûsiv

Rêşan Yûsiv di sala 1988’an de li bajarê amûdê ji dayîk bûye û li wir dijî, ji zaroktiya xwe ve ji huner, peykersazî û şêwekariyê hezkiriye û dibîne ku huner pê re ji dayîk bûye, malbata wî ji zaroktiya wî ve piştgirê wî bûn û gelekî pêre alîkar bûn û heya roja îro jî pê re alîkarin.**R-7**



# Bi 8'ê Adarê ber bi pêlên berxwedanê ve

Dema ku mirov bixwaze çavên xwe li dîrokê bigerîne, pêwîste berê xwe bide dîroka jin, ji ber ku eger ne ji hebûna jinê buya wê dîrok ewqas giran nehatiba nivîsandin. Eger ne ji xwedawendî, afrînerî, xûliqkarî, fedakarî û avakirinên ku bi destê jinê çêbûne, dê jiyana îro, vegera li dîroka par û naskirina hebûna xwe tunebûya.



**Lîlav Elî**

Dema ku mirov bixwaze çavên xwe li dîrokê bigerîne, pêwîste berê xwe bide dîroka jin, ji ber ku eger ne ji hebûna jinê buya wê dîrok ewqas giran nehatiba nivîsandin. Eger ne ji xwedawendî, afrînerî, xûliqkarî, fedakarî û avakirinên ku bi destê jinê çêbûne, dê jiyana îro, vegera li dîroka par û naskirina hebûna xwe tunebûya.

Di dîroka mirovahiyê de, di nava pêlên jiyana ber bi îro ve, jin bû xwedawenda gerdûnê, bû serpêhatiya hemdemî û navê xwe her di nava rûpelan de vejandin. Di wextekî de ku mirov li mirovahiyê digerî, jinê bi zanebûn û jêrêtiya xwe mirovatî ava kir, bi destekê tovên malbatê û bi destê din jî tovên civakek exlaqî belav kir. Jinê li hemberî newekheviyê, edalet, li hemberî şer aştî, li hemberî xizanî xwetêrkirin, li hemberî neheqî xweparastin ava kir. Jin bi lehengî, berxwedanî û wêrekiya xwe jiyanek ji milyonên mirovan re hûnand.

Li hember vê yekê, mêrsalar ku her tim li hemberî hêza jinê çavên xwe teng kiriye, xwest keda bi hezarê salan a jinê ji destê wê bike û wê ji xwedawendiya wê daxîne. Mêrê serdest jin wekî nezan û bê hêz da pênasekirin, wê ji radeyên herî jor a xwedawendiyê daxist radeyên herî jêr a kolekirinê, nasnameya wê tune û ew bê nav hişt. Bi kolekirina jinê re feraseta desthilatdariyê li gel mêr bi pêş ket û serweriya xwe li ser malbatê ava kir, xwe wekî hêza bingehîn û zane da pênasekirin û jin jî tenê di warê xizmetkirinê de xeniqand.

Lê her dem, da ku jin nasnameya xwe ya rast vegerîne û bibe xwediya hebûna xwe, serî hildaye û serkêşî ji azadiyê re kiriye. Çîroka 8'ê Adarê jî mînaka vê yekê li ber çavên mirov radixe.

Li gorî lêkolînan, di roja 8'ê Adara 1857'an de li eyaleta New York a Amrêkayê nezîkî 40'hezar jin, ji bo ku şertên xêbata wan baş bibe, dest bi giravê dikin û daxwaza jinên ku dest bi giravê dikin ku seatên wan yên kar bibe 8 seat û heqdestekî wekhev ji wan re were dayîn. Lê Piştî vê di encama giravê de kargeha jinan hate şewitandin û bi qasî 129 jin hatin şewitandin û jiyana xwe ji dast dan.

Piştî vê buyerê di sala 1910'an de li Kopenhagê konferensa jinên sosyalîst a neteweyî ya duyemîn hate li darxistin. Di konfernsê de Kilara Zetkin derbarê rojeke jinan ya cîhanî de ku jin karibin tê de daxwazên xwe bînin ziman pêşinyar kir û pêşniyara wê hate qebûlkirin.

Di 16'ê Kanûna 1977'an de Netewên Yekbûyî 8'ê Adarê weke roja jinan ya cîhanî raghandin.

**Di Rojhilata Navîn de, rewş û hewlên ji holêrakirina navê jin**

Di Rojhilata Navîn de herî zêde pergala mêr a 5 hezar sal li ser jinê serwer bû, bi taybetî di bin navê ola îslamî de û li welatên ereb wek Sûriyê, Sûdan û Erebistanê hebûna jin hat tepsandin. Zihniyeta mêrê serdest ku xwe dispêre netew dewlet û kapîtalîzmê jin ji hemû qadên jiyanê dûr xist, ew bê îrade û hêz pênase kir, tevahî qadên xebatê di bin serweriya mêr de bû û qedexe bû ku jin heta nêrîna xwe jî bîne ziman. Di warê rêvebertî, xwe pênasekirin, zanîn, xwendin û hwd de jin mehrûm ma. Jin ji dibistanan hat dûrxistin û di malan de wekî alavekî zarokanînê û xizmetkirinê hat hiştin. Bi taybet li welatên Ereban jin di temenên biçûk de di bin navê " xwe bistirî" ne de hat zewicandin, di vê mijarê de eger jinê nerazîbûna xwe nîşan bida yan jî red bikira an dihat îşkencekirin an jî dihat kuştin. Bi gotina ku "Gotin a mêrê malê ye" jiyana jinê ji binî ta jor di bin destê mêr de bû.

Di bin navê " Jin jê fêm nake" qedexe bû ku jin cihê xwe di saziyan de bigire û li kêleka mêr civakê bi rêve bibe. Netew-Dewlet ji bo pêkanîna berjewendiyên xwe ya desthilatê jin tenê di warê reklaman de da karkirin û wekî sile bi kar anî. Ji ber vê yekê dema em niha li rewşa ku Rojhilata Navîn tê de binêrin, ev krîz û şerên ku jiyan dike em dikarin bi rewşa jin, neqebûlkirina wê, redkirina wê û tunekirina afirîniya jinê ve girê bidin. Eger jin nehatiba kolekirin û mafê wê yê jiyankirinê nehatiba dizîn, eger jin wekî rêvebera yekem bihata dîtin helbet dê rewşa Rojhilata Navîn ne di vî halî da ba.

**Di Kurdistanê de rewşa jin û têkoşînê ber bi azadiyê ve**

Pergala mêr-dewlet li Tirkiyê bi rêjîma AKP'ê re tevahî Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê veguherandiye zîndana darizandina jinên zana, tekoşer, berxwedêr, çalak û serhildêr. Rojane jinên rojnemavan ên ku dixwazin rastiya êş û polîtîkayên qirkirinê yên li dijî wan ji raya giştî re raghînin tên binçavkirin û girtin, li aliyekî din desthilata AKP her dem da ku jinan bê deng bike, ji mafê wan bê par bihêle û di nava sîstema xwe ya krêt de wan tengav bike serî li her cûre sûc, kiryar, kuştin, îşkencekirin, destdirêjî û komkujiyan daye.14'ê Kanûna 2015'an de li Silopya'ya Bakurê Kurdistanê qedexeya derketina derve hat destpêkirin û derdora navçeyê hat girtin, lê li gel êrîşên dijwar û dorpêçê jî xelkê navçeyê dev ji taxên xwe bernedan û li ber xwe dan. Di nava berxwedanê de 3 jinên siyasetmedar û têkoşer hebûn; Endama Meclisa Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) Sêvê Demîr, Hevseroka Meclisa Gel Pakîze Nayir û Endama Kongrey a Jinên Azad (KJA) Fatma Ûyar, her sê jinan bi rihê berxwedanê eniyên xwe li hember dijmin hildabûn, ji lewra di 4'ê Çileya 2016'an dewleta Tirk a qirker her sê jinên siyasetvan hedef girt û komkujiyek derheqê wan de pêk anî.

Dîsa rêjîma Îranê bi kiryara sêdareya jinan mohra xwe li dîrokê daye û dijmintiya xwe ya li hember jinên serhildêr eşkere kiriye û dike. Ji lewra zanista têkoşîn û lêgerîna heqîqetê ya jinên Îranî ewê vê pergala mêr a ku xwe disepêne, hilweşîne û jiyanek azad ava bike. Li Îraq û Başûrê Kurdistanê jî hişmendiya mêr bi qasî kûrbûye tu rojevek bi navê jin tine ye.

Lê eger em li rewşa jin di Rojavayê Kurdistanê de binêrin dê cudahiyek derkeve holê. Bi geşbûna Tevgera Azadiyê re ku hêza xwe ji vîna jinê digire û pêre di 19'ê Tîrmeha 2012'an de gelê Rojava û gelên Bakurê Sûriyê, li dijî hovîtî û tarîtiya rejîma Esad, xeta 3'yemîn ava kirin û modeleke civakî ya nû ya li ser bingeha wekhevî, demokrasî û azadiya pêkhateyan, jinan, baweriyan û ciwanan avabûyî dan ber xwe. Şoreşa 19 Tîrmehê ku di nav xwe de şoreşa azadiya jin ava kir, bû îlhama azadiyê û ber bi Rojhilat Navîn ve herikî. Bi saya felsefeya Netewa Demokratîk ku Rêber Abdullah Ocalan pêşkeş kiriye, jinan li Rojavayê Kurdistanê bi têkoşîn, berxwedan, lehengî, wêrekî û meşandina şerê azadiyê mohra xwe li dîrokê yekem car di Rojhilata Navîn de bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê jinan cihê xwe di Hevserokatiyê de girt û li ser masayan û di civînan bû xwedî biryar, jinan li aliyekî çek hilgirt û parastina axa xwe kır, li aliyekî pênûs hilbijart û zimanê xwe pêşxist û li aliyê din jî bi îdeolojiya wekheviyê, azadiyê û demokrasiyê li cewhera xwe geriya.

Îro li Rojavayê Kurdistanê ku bi keda destê jin şoreşa xwegihandina azadiyê ava bûye, pêşengên vê şoreşê dibin armanca polîtîkayên qirkirin, tunekirin, ji holêrakirin û tasfîyekirinê. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ku bi şoreşa jin tê naskirin, dijminê sereke yê şoreşê dewleta Tirk a dagirker niha di şexsê jinan de dixwaze destkeftiyên şoreşê têk bibe. Ji Hebûn, Zehra û Yadê Emîneyan bigire, heta bi Sorxwîn û Azadîyan dewleta Tirk bi berdewamî pêşengên şoreşa 19'ê Tîrmehê û fermandarên ku DAIŞ'ê têk birin, dike hedefa êrîşên xwe. Bêguman ev êrîş nikarin vîna jina perwerdekirî bişkînin, berovajî wê yekê jinên herêmê di serxistina projeya demokratîk de bi israr in.

Cihgirtina jin di şoreşa Rojava de bandor li parçeyên din ên Kurdistanê, Rojhilata Navîn û li Cîhanê kir. Bi rihê şoreşa jin a 19' Tîrmehê, jinan li Rojhilatê Kurdistan û Îranê bi qetilkirina jina ciwan a kurd Jîna Emînî di 16'ê Îlona 2022'an re her li hember desthilata tarî ya Îranê bi şewitandina şalên serî û jêkirina keziyên xwe ji desthilata Îranê re gotin na. Jinan bi dirûşma "Jin Jiyan Azadî" serhildanek ku navê xwe di dîroka têkoşîna jinên kurd û azadîxwaz de nivîsand lidarxistin.

Tevî gef, êriş, zext û gulebaranên hêzên rejîma Îranê ,lê dirûşma "Jin Jiyan Azadî" ku li tax, kolan û bajarên Îran û Rojhilatê Kurdistanê bi dengê hat qîrkirin bû felsefeyek cîhanî û ew nav li ser dîwarên welatên biyanî hat nivîsandin her wiha jinan di rûniştinên xwe de banga mezinkirina vê felsefeyê kirin. Çawa ku jinan bi hezarên salan li ber xwe dane û agirê şoreşê herdem berz kirine, îsal jî jinên li seranserî Kurdistan û cîhanê bi coşa avakirina pergaleke wekhev dadikevin qadan. Bi taybet jinên Kurd îsal di serxistina projeya demokratîk û azadkirina Rêber Apo de bi israr in.

## Ramangeh

### Rêwîtiya ji Clara heya Sarayan e ;8'ê Adarê

**Zozan Cizîrî**

Dema demsal dibe bihar çavê hemû jinan li 8'ê Adarê ye. Li gor jinan bihara rast bi 8'ê Adarê re destpê dike û bi rastî rengîniya di nav şahiyên vê rojê de, bi rûkenî û geşbûna jinan re xweza jî bi gul û kulîlkên renga reng dixemile. Ango coş û kêfxweşiya jinan bi rengîniya xwezayê re demsala biharê pêşwazî dike.

8'ê Adarê çima evqas coş û heyecanek mezin dide me jinan? Li ser rûyê her kesî beşişîn û kêfxweşiya heyî xwediyê wateyek mezin e. Heqîqet ev e ku roja 8'ê Adarê di encama ked û têkoşîneke mezin a jinan de pêk hatiye. Cara yekê sala 1908'ê li bajarê New Yorkê 15 hezar jinên xebatkar daxwaz dikin ku wextê wan ê li ser kar were kêmkirin, mûçeyê wan were zêdekirin û mafê hilbijartinê bidin wan jî.

Piştî vê bi salekê Partiya Sosyalîst a Amerîka 8'ê Adarê wek Roja Jin a Neteweyî îlan dike. Lê yekem car Clara Zetkîn fikra ku vê roja taybet bikin rojeke navneteweyî dide pêş. Clara Zetkîn çalakvanek komunîst û parêzvaneke mafê jin bû. Sala 1910'ê ku li Kopenhagê Konferansa Jinên Kedkar a Navneteweyî tê lidarxistin, Zetkîn nêrîna "Roja Jin a Cîhanê" pêşniyar dike. Ji 17 welatan 100 jin beşdarî vê Konferansê dibin û hemû vê pêşniyara Zetkîn bi yek dengî qebûl dikin.

Çalakiyên navneteweyî cara yekem sala 1911'ê li Awusturya, Danîmarka, Almanya û Siwêdê tên lidarxistin. Sala 1917'ê di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de jinên Rûs ên kedkar bi dirûşmeya "em nan û aştiyê dixwazin" herikîn kolanan. Roja çarê ya van çalakiyan Çarê Rûs ji textê wî hat xistin. Hukûmeta demkî hatî avakirin jî mafê hilbijartinê da jinan. Ev dîrok jî li gor teqwîma mîladî cardin 8'ê Adarê bû.

Her çendî NY (Neteweyên Yekbûyî) ev roja 8'ê Adarê sala 1975'ê wek Roja Jin a Cîhanî qebûl kiribe jî, di pratîkê de hewldaneke cidî li gor vê biryarê raber nekir. Jixwe em vê rastiya wan roja îro jî eşkere dibînin. Dilxwede NY salane temayekê li ser 8'ê Adarê diyar dike, bi ziman behsa roja jin dike, lê pratîk heya dawî dijberê gotinên wana ye. Em binêrin Îran dewletek endamê NY ye, lê di pêvajoya serhildanên "Jin Jiyan Azadî" de tu helwesteke nirxê xwe yê guh bide dengê bi milyonan jinên li meydanan raber nekir. Cardin Tirkiye dewletek endamê NY ye, lê rojane li welatê me Kurdistanê jinên azadîxwaz û berxwedêr dike hedef û bi guleyên namerd qetil dike. Em binêrin heya niha NY tu helwestek li hemberî dewleta Tirk a kujerê jinan raber nekiriye. Wekî van em dikarin nimûneyên gelek dewletên endamên NY bidin ku mafê jin bi tu awayî nas nakin, bi ser de reflekseke însanî jî nîşan nadin.

Têkoşîna jin a bi hewldanên Zetkînan di nav ruhê civakê de pêl bi pêl herikî, piştî 67 salan li Kurdistanê di kesayeta hevrê Sara (Sakine Cansız) de jinûve şîn bû û ket qonaxek nû. Hevrê Sara wek Xwedawenda Hemdem, tevahî jiyana xwe xist xizmeta hemû jinan û gelan. Lewre 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê berhema ked û xwîna Zetkînan û Sarayan e, nirxê pîroz ê tevahî jina ye. Li ser vê bingehê mirov dikare her meydaneke şahiyên 8'ê Adarê wek meydana azadiya jin bi nav bike, vê rojê wek roja hevgirtina jinan silav û pîroz bike.




# Peykersaz Rêşan Yûsiv

Rêşan Yûsiv di sala 1988'an de li bajarê amûdê ji dayîk bûye û li wir dijî, ji zaroktiya xwe ve ji huner, peykersazî û şêwekariyê hezkiriye û dibîne ku huner pê re ji dayîk bûye, malbata wî ji zaroktiya wî ve piştgirê wî bûn û gelekî pêre alîkar bûn û heya roja îro jî pê re alîkarin.

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Berî ku berê xwe bide peykersaziyê, karê şêwekariyê dikir, şêwekarî bingeha wî ye. Peykersazî û şêwekarî ji hev cûda nabin. Tişta ku hêlişt hezkirina Rêşan Yûsiv ji kevir, herî û peykera re zêde bibe, bajarê Amûdê ye. ji berî 35 salan heya roja îro kargeha malbata wî ya kevir û rûxamê heye, ev yek



jî bû sedema ku hezkirina wî ji peykeran re zêde bibe, herwiha bi riya peykersaziyê re dîroka gelan tê naskirin.

Peykersaz Rêşan Yûsiv di derbarê jiyana xwe de ji Rojnameya me re axivî.


**Bandora peykeran li ser mirovan**



Rêşan Yûsiv diyar kir ku di temenê 7 salî de hezkirina wî ya Peykersaziyê dest pê kir, wî xwe bi xwe fêrkir û wiha got:"Ev ast û karên ku heta roja îro min kirine hemû fêrkirina takekesî bûn, peykersazî hunereke taybete di jiyana mirov û gelan de, herwiha min dixwest ez bizanibim heta çi astê bandora van peykeran li gel û derdorê heye. peykersazî gelek sûdên wê hene, bi taybet dema sazkirina rûyan de, ev yek gelek bandora wê ji aliyê tenduristî li ser mirov û gel heye. Herwiha encama bandora wek; derbirîna li ser çand û nasnamiyê, ji ber ku peykersaziya rûyan xeteke di riya wê re mirov dighe fêrkirina nasnameya xwe. Di heman demê de sembola peykerên rû, derbirîna nasnameya pêkhateyan dide. Bandora duyem jî peywendiye, ev peyker dihêlin mirov bi heycan bibin û hest di navbera wan û peykeran de avabibin. Ya siyem gava mirov li peykerê rû dinêre rehetî û xweşiyek pê re çêdibe, ev yek jî dihêle rih, dil û mejî gelekî ciwan û aram bibe."

**Kar û xebatên heta roja îro kirine û hîn jî berdewamin**

Yûsiv wiha pê de çû û got:"Di bin navê avakirina jiyanê de ez li ser peykeran kar dikim. Pirojeya ku ji berî 5 salan li ser kar dike heta niha, avakirina jiyanê çiye, peykerê mêr, jin, zarok û ciwaniyê çê dikim. li ser felsefeya avakirina jiyanê, hezkirin, mirovatî û biratiyê, ji ber ku ev yek ji her tiştî mezintir e, ji şer û koçberiyê jî mezintir e. Di sala 2018'an de min çar peykerên nîvco yên helbestvan û nivîskarên kurd li bexçeyê xwendinê çêkirin. Di sala2021'an de min peykerê dayîkekî û zaroka wê di destê wê de, di bin navê xwedawenda jiyanê, ev peyker nêzî salekî dem xwar heya bidawî bû. Peykerê ku niha li ser kar dikin di bin navê vê felsefeyî ye; dixwazim bi riya rûyê peykerê ku niha li ser kar dikim ez hezkirin û ciwaniyê bidim xuyanîkirin, herwiha mirovahî bi rengê xwe yê tarî û ronahî bidim xuyanî kirin, mirov hêjaye jiyaneke hemû hezkirin bijî. Di dema niha de ez li ser girûpek peykerên jinên herçar parçeyên kurdistanê kar dikim, wek jina li Amûdê, Efrîn, Wan, Amed, Mihabad, Silêmanî, hewlêr û Hekarê ji aliyê cil û rol wê li van deran çiye. Herwiha




çêkirina peykerê mehsa Emînî di bin navê avakirina jin jiyan azadî de. Di sala 2023'an peykerê Evdalê Zeynikê jê çêkiriye. Di heman demê de peykerê helbestvanê kurd Ehmedê Xanî û peykerê seyîd Riza jî çêkirin."

**Xwendina Peykersaz Rêşan Yûsiv**

Peykersaz Rêşan Yûsiv axaftina xwe bidawî kir û wiha got: "Min di sala 2006'an de bawernameya amadehî wergirt û xwesteka min hebû ku ez fakulteya hunera bedew li Şamê bixwînin, lê ew derfet çênebû û ev xwestek pêknehat. Lê ji aliyê takekesî ve min karî xwe pêş bixim di vî alî de û bingeha min ya ku ez ji xwe re wek zanîngehekî dibînim bajarê Amûdê ye. Herwiha di hundirê male de jî min pirtûk dixwendin li ser jiyana hunermendên cîhanî û min kar dikir bi vî awayî min karî ez xwe pêş bixim. Di heman demê de min gelek guhdan da dîrokê ji ber ku gava yek dîroka xwe nas neke, xwe nasnake, ji ber vê yekê heta ku mirov xwe fam bike divê dîroka xwe fambike. Di sala 2022'an de Zanînga Rojava nasnameya hunerî wek diyariyekî dane min. Ev yek kelecan û heyecana min ji aliyê peykersazî û hunerê ve zêdetirkir. Ji bilî karê peykersaziyê, ez mamosteyê beşê peykerim li Zanîngeha Rojava, bi riya hunera bedew re ez û şagirtîn xwe em karekî ciwan dikin û ez wan fêrî çêkirina peykeran dikim, carnan alîkariya malbata xwe jî dikim di kargehê de."



# Xemla kurdan bi cil û bergên kurdî xweşik dibe

**Hêvî Melek/ Qamişlo**

Ciwan El Elî di sala 1980 li gundê Sîha ê giredayê bajarê Tirbesipiyê ji dayik bûye, ji zaroktiya xwe de karê dirûtinê dike, ku ji 6 saliya xwe de bi bavê xwe re li bazara Qamişlo karê dirûnê dikir. Ciwan diyar kir ku tişta herî xweş di cîhanê de ku kurdek cil û bergên newrozê bi destê xwe bidrûnin.

Di derbarê çêkirina cil û bergên Kurdî de Ciwan El Elî,fatma Hiso û Xebat Osman ji rojnameya me re axivî.

Elî karê dirûnê ji bav û kalê xwe girtiye, her wiha diyar kir ku cara yekem ku min cil û bergên Kurdî çêkirin kêfxweşiyeke pir mezin ket dilê min de,û wiha got: li cem min tişta herî xweş ku kurdek cil û bergên kurdî bidirûne. Bi hatina heyva Adarê re her kes lez dikin ku cil û bergên xwe beriya cejna newrozê bi dawî bikin ev yek jî dibe cihê kêfxweşiya min. cûdahiya vê sale ji salên din heye ,bi bilindbûna nirxê dolar re caw jî buha bûye





**Ciwan Elî**



**fatma Hiso**



**Xebat Osman**

ji ber vê yekê jî gelek kesên ku derfetên wan tune ne ji bo ku cil û bergên newrozê ji xwe re bikirin yan jî çêbikin, astengiyên ku em têre derbas dibin ewe ku nirxê her tiştî buha bûye bi vê yekê jî karê me sal bi sal kêm dibe, cil û bergên ku ez çêdikim buhayê wan di navbera 100 heyanî 150 hezarî de ye.

Di heman mijarê de Fatma Hiso ji rojnameya me re axivî.

Fatma da diyar kirin ku Kiras û xeftan sembola Kurda ye divê ku her kes xwedî li cil û bergên xwe derkeve, di roj û cejnên pîroz de li xwe bikin. Her wiha Fatma da zanîn ku cil û bergên kurdî kevneşopiyên me ne divê ev cil û berg werin li xwe kirin ji bo ku çand, wêje û kevneşopiyên me wenda nebin, dema ku hin jin daxwaza çêkirina cil û bergên kurdî li me dikin , em pir bi wan kêfxweşdibin, Fatma anî ser ziman ku dema mirov ji karekî hez bike tu astengî têde nabîne di heman demê de jî çêkirina Cil û bergên Kurdî ez tu astengiyan di çêkirina wan de nabînim. Fatma Hiso di dawiya axaftinê xwe de da zanîn ku banga min ji hemû jinan re ku xwedî li cil û bergên xwe derkevin ji bo ku kevneşopiyên me werin parastin bi vê yekê jî çand, ziman û wêjeya Kurdî nayê wenda kirin.

Di heman çarçoveyê de Xelat Osman da xûya kirin ku cil û bergên Kurdî her dem nayên li xwe kirin tenê di cejin û şahiyan de tên li xwe kirin, û wiha got ji bona parastina çanda û kevneşopiyên Kurdan pêwîste ku her mirovekî Kurd, cil û bergên kurdî li xwe bike û bi vê rengê çanda Kurdî dikare xwe ji wendabûnê rizgar bike. Zehmetiyên ku em têde derbas dibin ne ji aliyê çêkirina cilan de ye lê di aliyê kirîna caw de ye ji ber ku caw li bazaran pir buhaye û gelek kes nikarin cil û bergan ji xwe re çêkin. Her wisa Xelat Osman di dawiya axaftinê xwe de banga xwe anî ser ziman û got: banga min ji hemû kesên li cil û bergên xwe xwedî derkevin ji bo ku çand jî were parastin.

# Yekemîn nexweşxaneya penceşêrê li bajarê Qamişlo

Yekemîn nexweşxaneya penceşêrê,Telasîmya û şewatê di 19`ê Çileya 2023`yan de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûryê nexweşxanek li bajarê Qamişlo ji aliyê Heyva Sor a Kurdî hat vekirin. Di nexweşxaneyê de 4 bijîşkên ku ji bo xizmeta civakê bi awayekî bê pere kar dikin.

**Navenda nûçeyan**

Ji demên berê de pêdiviya civakê bi nexweşxaneyekê wisa hebû ji ber ku malbatên kesên nexweş neçar dibûn ku nexweşên xwe derbasî nexwşxaneyên Şamê yan jî Başûrê Kurdistanê bikin. Lê piştî vekirina vê nexweşxaneyê barek giran li ser milê civakê hat rakirin. Ji ber ku ev nexweşxane bi awayekî bê pere kar dike û di bin xizmeta civakê de ye.

Derbarê kar û xebatê nexweşxaneyê de rêveberiya piroseya tenduristiyê û odeya rewşên awarte ya heyva sor a Kurdî Ferhan Silêman ji rojnameya me re axifîn.

Ji sala 2022`yan de û bi alîkariya Heyv asor a kurdî me dest bi avakirina nexweşxaneyê kir. Nexweşxane di nava xwe de 3 beşan dihewîne, beşê penceşêrê, Telasîmya û beşê şewatê. piştî avakirina nexweşxaneyê di Çileya 2022`yan de beşê penceşêrê hat vekirin û anha jî em amedekariyan ji bona beşê Telasîmya dikin, ew jî ber bi dawîkirinê ve diçe. Silêman da diyarkirin ku armanc ji avakirina nexweşxaneyê, ew e



ferhan Silêman



Emced Elî

ku di Bakur û Rojhilatê Suryê de nexweşxaneyeke ku van nexweşiyan derman bikin tuneye û kesên nexweş neçar dimînin ku ber bi Şam û Başûrê Kurdistanê ve herin û li wê derê werin dermankirin. Herwiha di van demên dawiyê de nexweşiya penceşêrê pir zêde bûye, ev jî dibe pirsgirêkek xeternak di nava civakê de. Weke heyva sor me xwest ku em gavekê bavêjin ku em bibin parçeyek ji çareserkirina vê pirsgirêkê. Raste ku em nikarin bi temamî nexweşan derman bikin, lê emê hinek bar ji ser nexweşan rakin, weke qurç, sîram,dermanên razanê, çavdêriya bijîşkan, analîzkirina xwînê û dermanên pêwîst ji nexweşan re. Weke yekemîn nexweşxane di bin çavdêriya 4 bijîşkên taybet de ye ku ev bijîşk jî bi awayekî xwe bexş û bê pere di nexweşxaneyê de kar dikin ji bo ku alîkariyekê bi civaka xwe re bikin.

Silêman ragihand ku hîn beşê şewatê nehatiye vekirin, lê sîstema germ û cemidî û paqijkirinê 24 demjimêran têde peyda dibe. Nexweşxaneya me gihaştiye asteke pir pêşketî ku Oksîcena navendî, stasyona ava paqij têde heye, Ji bilî wê jî di nexweşxaneyê de dermanxaneyek heye her tiştê girêdayî vê nexweşxaneyê bê pere ye û di bin xizmeta civakê de ye.

Rêveberê piroseya tendrostiyê û odeya rewşên awarte ya heyva sor a Kurdî Ferhan Silêman di dawiya axaftina xwe de wiha got: Ev nexweşxane pêdiviya wê bi alîkariyê heye ku kesên welatparêz ji derve yan jî di hundir de ku bi civaka xwe re bibin alîkar û xwedî li nexweşxaneyê derkevin ku em qurç û dermanên pêwîst ji nexweşan re peyda bikin û nema hewce bike ku ji bo dermankirina xwe ber bi Şam û başûrê kurdistanê ve biçin''

Herwiha derbarê nexweşxaneyê de yek ji Bijîşkên ku di nexweşxaneya penceşêrê de bi awayekî bexş kar dike. Emced Elî ji rojnameya me re da xwiyakirin ku beşê telasîmya wê di demeke kurt de were vekirin. Telasîmya nexweşiyeke helandî di xwînê de ye, her dem nexweş zehmetiyê ji aliyê kêmbûna xwînê dikşîne,nexweş carnan bi hewceyî piroseyê dibe bi taybet jêkirina zirav, ji ber vê yekê em bi hêvîne ku her kes alîkarî û piştgirî bide nexweşxaneyê. Ji ber ku pêwîstiya kesên nexweş bi dermanên taybet heye û buhayê van dermanan jî pir zêdeye û malbatên kesên nexweş nikarin van dermanan bi vî buhayî bikirin û peydabikin. Ji ber vê yekê banga me ji her kesî re ew e, ku piştgiriya vê pirojeyê bikin, ji bo ku em karibin van nexweşan bi hêsanî derman bikin û pêdiviyên wan bi cih bînin''.




# 'Tevî êrişan jî xebatên embarên genim didome'

**Navenda nûçeyan**

**Rêveberê embarên genim yên bajarê Qamişlo, Ferhad Zênal anî ziman ku kar û xebatên embarên genim yên ku dikeve xizmeta civakê de, tevî hemû astengiyan jî herdem berdewame.**

Depoyên genim ên bajarê Qamişlo ango 'sewamih' di sala 1973`yan de hatiye avakirin. Ev depoyên genim weke avahiyekê ne û dikevin bin xizmeta civakê.

Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re û vekişîna hikumeta Şamê ji piraniya saziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rêveberiya Xweser ji bona saxlem kirin û parastina depoyên genim ên bajarê Qamişlo dest bi kar û xebatê kir in.

Rêveberiya Xweser ji bo komkirina genim êdî dest bi kirîna genimê cotkarên herêmê kir. Heta roja îro jî kar û xebat hîn tê meşandin. Ji bo peydakirian ard ji bona pêdivêiyên gel re aşekî mezin jî di nava xwe de dihewîne. Hejmara xebatkarên ku di di Depoyên Genim yên Qamişlo de kar dikin 30 endam in. Herwiha 8 ji wan erka wan çavdêriya depoyan e, hejmara endamên ku di karên genim de pisporin, 8 endam in û 14 endam jî ji bo parastin û ewlehiya depoyan ne.

Ev aş bi awayekî rojane genim dihêre û ard li tevahiya firneyên kantona Cizîrê belav dike û bi vî awayî karê xwe didomîne.

Di derbarê kar û xebata Depoyên Genim yên bajarê Qamişlo de rêveberê wê Ferhad Zênal ji rojnameya me re axivî.

**Kar û xebata depohên genim û astengî**

Ferhad Zênal diyar kir ku ev depo bi cureyên genim yên hişk û nerim di nava xwe de dihewîne û wiha got: "Weke ku tê zanîn depoyên Genim yên bajarê Qamişlo, aşekî jî di nava xwe de dihewîne, ew jî ji bo ku genim bibe ard û li firneyên kantona Cizîrê were belavkirin. Genimê ku ji cotkaran tê girtin dibe çar beş, beşa yekem û duyem bi giştî li aş tê veguhestin. Di heman demê de û beşa sêyem û çarem jî tê bêjingkirin û di depoyan de tê komkirin û firotin. Ji 15 heta 20 rojan ev depo ji bo ku zingar negre û genim paqij bimîne, tên şopandin. Armanca me ji vê yekê parastina genim ji kêzikan e. Du cureyên kêzikan hene yên herî bi tehlûke ne, weke kêzika Xabra û Xunfusa û dibe ku ev kêzik bikevin nav genim de û êdî ew genim neyê bikaranîn. Ji ber vê yekê bi awayekî rojane ardê heyî bi dermanên taybet tê paqijkirin. Hêjayî gotinê ye ku ev derman bandora wê ya neyinî li ser mirovan tuneye. Li aliyekî din jî hin astengî derdikevin pêşiya kar û xebata me, weke lewazbûna alektrîkê. Amûrên me yên depoyê bi hewceyî hêzeke mezin ji elektrîkê ne, ji ber ku bi awayekî rojane ev kar bêrawestandin tê kirin. Ji destpêka depoyên genim ketine bin xizmeta gelê de, her sal çeksazkirin têde tê kirin. Nimûne ji vê yekê dema amûrek ji depoyê ji kar were rawestandin, endamekî taybet ji bo çeksazkirinê heye û van amûran çêdike. "



**firehiya depoyên genim**

Rêveberê Depoyên Genim yên bajarê Qamişlo, Ferhad Zênal anî ser ziman ku 60 şaneyên ji bo bicihkirina genim ku her yek ji wan bi ferehiya 1200 ton genim digre nava xwe, hene û wiha got: " Ev depoyên genim pir kevn bûne, dîroka wan vedigere zêdeyî 50 salan û ji wê demê ve bê rawestandin di bin xizmetê de ne. Hin amûrên teknîkî hene ku dema ji bin xizmetê derdikevin, bi zehmetî tên bidestxistin, carcaran jî nayên peydakirin. Herwiha komîteyên çeksazkirinê yên taybet hene ku bi van karan radibin. Hêjayî gotinê ye ku hejmara şaneyên mezin yên ji bo bicihkirina genim 60 şane ne û her yek ji van şaneyan 1200 ton genim tê de bi cih dibe. Li kêleka van şaneyên genim yên mezin şaneyên biçûk jî hene û genim di wan de jî tê bicihkirin. Depoyên Genim ên bajarê Qamişlo salane 85 hezar ton genim di şaneyên wê de tê depokirin. Tevî ku êrişên dagirkeriya Tirk li ser herêma me yên ku binesazî û navendên xizmetguzariyê hedef girtin, lê dîsa her dem kar berdewam e.





# 8`ê Adarê sembola berxwedana jinê ye


Jinên Kurd, Ereb, Suryan û Ermen yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku 8`ê Adarê ji bo wan xwedî wate û girîngiyeke mezin e û wiha gotin; "8`ê Adarê ne bi hesanî ji jinê re bûye rojeke cîhanî, bi berdêlên mezin yên jinên berxwedêr bûye sembola berxwedana jinan û rojeke dîrokî."

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Berî Şoreşa Rojava, jinên pêkhateyên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di bin navê kevneşopiyan de, di bin koletiya mêr û dewletê de jiyan dikirin. Li tevahî cîhanê jin bindesta mêr û dewletê bû, bi vê yekê civak jî kole bibû, ji ber azadiya jinê azadiya civakê ye. Lewra Şoreşa Rojava ya ku bi fikir û felsefeya Rêber Apo hat lidarxistin, bi şoreşa azadiya jinê hat naskirin. Piştî şoreşa Rojava jinên pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin pirojeya netewa demokratîk de û dirûşmeya 'Jin Jiyan Azadî' reng û dengê xwe kirin yek, ev yek li cîhanê deng veda. Bi taybet jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê her sala jin bi şahî û çalakiyên xwe roja jinê ya cîhanî dike roja vejînê.

Jinên pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê 8'ê Adarê Roja Cîhanî a Jinan li tevahiya jinên cîhanê pîroz kirin û derbarê girîngiya vê rojê de ji rojnameya me re axivîn.

Jina bi navê Êvlîn Gewriyê ku ji pêkhateyê Suryane diyar kir ku jin ji dîrokê ve têkoşînê ji bû azadiya xwe dide meşandin û wiha got: "Dema em li dîroka mirovahiyê vedigerin bingeha wê ji jinê hatiye destpêkirin, lê bi hatina dewletên



Êvlîn Gewriyê



Sîham Silêman



Newal Mizyed



Enahîd Qesebyan

desthilatdar re hemû destkeftiyên jinê dan binpêkirin û jin di bin navê kevneşopiyan de kir koleyê xwe. Lê berxwedana jinan ji bo parastina destkeftî û azadiya xwe mezin bû. Lewra jinê ji dîrokê ve hêza xwe li hemberî hemû zor û zordestiyan da xuyakirin. Di heman demê de heger em vegerin jiyan xwezayî ya ku jin wê di bin navê wekheviyê de birêve dibir, çiqasî azad bû, ji ber hizra jina azad avakirin û pêşketina civakê ye. Ji xwe 8`ê Adarê bi roja vejîna jinê ya cîhanî tê naskirin, lê em jinên hemû pêkhateyan em ê hemû rojan bikin rojên vejîn û berxwedana jinên azadîxwaz, vê yekê mê di riya hevgirtin û yekîtiya jinan re pêk bînin."

**'Jin îro xwedî nasname, hebûn û biryar in'**

Jina bi navê Sîham Silêman ku ji pêkhateya Kurde, derbarê girîngiya 8`ê Adarê ji bo gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê wiha anî ziman: "8`ê Adarê ji bo jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xwedî girîngiyeke mezin e. Her sal bi dirûşmeyên cuda û bi ruhê têkoşînê ku her ku diçe mezin dibe vê rojê pêşwazî dikin. Jinên Kurd bi cil û bergên xwe yên gelêrî pêşwazî dikin. Herwiha Îsal em ê 8'ê Adarê bi dirûşmeya 'Jin, jiyan, azadî' ku li gelek welatên cîhanê bûye dirûşma hemû jinên cîhanê pêşwazî bikin. Û desthilatdarên ku li hemberî jinan serdestiya xwe didan meşandin, armancên wan pûç bûn, ji ber bi belavbûna fikrê Rêberê Gelan Rêber Apo û destpêkirina Şoreşa Rojava re jin tiştê aîdê xwe dîsa girt û jin îro xwedî biryar in û di asta siyasî, civakî, leşkerî û aborî de xwe bi cih kirine. Ji ber vê sedemê em her sal soza berdewamkirina têkoşînê û parastina axa xwe nû dikin."

**'8`ê Adarê sembola berxwedana jinê ye'**

Di heman çarçoveyê de jina bi navê Newal Mizyed ku ji pêkhateya Erebe da eşkerekirin ku 8`ê Adarê guhertineke mezin bi jinên Ereb re da avakirin û wiha got: "8`ê Adarê ji bû me jinan ne tenê rojeke pîrozbahiyê ye, xwedî wateyeke mezine, ji ber guhertineke mezin ji bû hemû jinan da avakirin, bi taybet bi jinên Ereb re, yên ku din nava kevneşopiyan de rastî hemû cûreyên tundiyê dihatin. Lê bi saya şoreşa Rojava ya ku bi şoreşa azadiya jinê hat lidarxistin, tundiya li ser jinan heta astekê hat rawestandin. Di heman demê de 8`ê Adarê sembola berxwedana jinê ye."

**'Em têkoşîna xwe bi rojekê sînordar nahêlin'**

Di heman mijarê de jina bi navê Anahîd Qesebyan ku ji pêkhateyê Ermene diyar kir ku 8`ê Adarê ne bi hesanî bûye roja jinên cîhanî û wiha got: "Heger em bên wateya 8`ê Adarê mirov nas dike ku ne bi hesanî ji jinê re bûye rojeke cîhanî, bi berdêlên mezin yên jinên berxwedêr bûye rojeke dîrokî. Ji ber heya niha jî tundî li ser jinan heye, zihniyeta zilamperesî hîna di hundirê civakê de heye, bi taybet jinên me yên di herêmên dagirkirî de bi gelek sûcan re derbas dibin. Ji bo wê em têkoşîna xwe bi rojekê sînordar nahêlin, hemû rojên me bi têkoşîn, berxwedan û daxwaza azadiyê derbas dibin. 8'ê Adarê roja ku jin koletî û biçûkxistinê red dike. Jinan gelek destkeftî bi dest xistin, ev destkeftî bi hêsanî bi dest nexistin. Ji ber vê yekê pêwîste jin ji bo parastina destkeftiyên îro têkoşînê bidomînin."

# Ji KCK'ê peyama 8'ê Adarê

**Navenda nûçeyan**

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê pîroz kir û têkoşîna jinan a li qada navneteweyî silav kir.

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi wesîleya 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê peyamek weşand û got: "Di şexsê Sakîne Cansiz (Sara) de şehîdên têkoşîna azadiya jinê bi bîr anî û birxist ku bi azadiya jinê re civak û jiyan jî azad dibe."

Peyama KCK'ê bi vî rengî ye:

"Em 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê pîroz dikin. Em têkoşîna jinan bi baweriya ku azadiya jinê wê bibe azadiya hemû mirovahiyê silav dikin û weke Tevgera Azadiya Kurd radigihînin ku em li ba jinê ne û hevgirtina xwe ya bi têkoşîna wan re tînin ziman.

Di pêşketin û civakîbûna mirovahiyê de cihê xweza, hest û hişmendiya jinê gelekî girîng e. Yekbûn, parvekirin û taybetiyên civakî yên jinan di civakbûna mirovan û pêşxistina jiyana civakî, fikir, zanîn, çand û hunerê de roleke pêşeng lîstiye. Jinê bi keda xwe pêşengiya pêşketina civakê kir. Xebatên herî bingehîn û girîng ên



jiyana rojane jî di nav de hemû nirx û pêşketinên ku bi kêrî mirovahî û civakê tên, keda jinê sereke ye. Watedayîna jiyana mirovan, exlaq û estetîkbûn encama van hest û hewldanan e ku jinê xwe tevlî kiriye. Bi kurtasî em bi hebûna xwe ya mirovî deyndarê jinan e.

Serdemên ku cewher û rengê jinê di jiyanê bi xurtî tê dîtin, di heman demê de serdemên azadî, wekhevî lê hebû û zext, desthilatdarî û mêtingerî lê tune bû. Mirovahî bi hezaran û deh hezaran sal bi vî rengî jiya ye, jiyana wan di nava azadî û aştiyê de derbas bûye.

Dema ku xwezaya jinê ya civakî û azadiyê ji civakbûnê qut bû û ji hesta azadî, wekhevî, aştî û hezkirinê bêpar ma, ji aliyê mêran hedef hat girtin, hevsengiya jiyanê têk çû û jiyana azadîxwaz, wekhevîxwaz a li ser esasê hezkirin, aştî û parvekirinê ji holê rabû. Ji dîroka ku feraseta serdest a mêr bi pêş ketiye, jin bi zext, mêtingerî û tundiya sîstematîk re rû bi rû ma. Heman tiştên ku bi serê jinan de anîn, bi serê civakê de jî anîn. Azadî û aştî ji holê rakirin û serdema şer, tundî, dagirkerî û qirkirinê destpê kir. Ji ber ku jin civakîbûnê temsîl dike, dema jin hedef tê girtin û bindest dibe, civak jî tê hedefkirin û bindest dibe.

Moderníteya kapîtalîst ji ber ku xwezaya jinê, ked û bedena wê dimêje, lûtkeya feraseta serdest a mêr temsîl dike. Moderníteya kapîtalîst her cure raman, zanist, teknîk, hunerê kiriye zayendperestî û mêtingeriyê. Moderníteya kapîtalîst jî sîstemeke herî zêde civak û jiyanê dişkîne û îstîsmar dike. Pergala ku herî baş têkiliya nêzîkatiya jinê û nêzîkatiya civakê derdixe holê moderníteya kapîtalîst e.

Bêguman jinan ji destpêkê heta roja me ya îro feraseta serdest a mêr û jiyana koledar, mêtinger qebûl nekiriye û li ber xwe daye. Bi saya vê dijderketin û berxwedana jinê, hişmendiya azadiyê û vîna civakê her tim zindî maye. Di cewhera têkoşîna bênavber a dîroka mirovahiyê ya li dijî pergala serdestî, mêtingerî û qirkirinê hatiye meşandin de sekna jinan a azadîxwazî û berxwedêrî heye. Têkoşîna azadiyê ya jinê di dîrokê de tu carî kêm nebûye, berevajî wê her tim bi pêş ketiye û mezin bûye, gihiştiye astekê ku di serdema me de pêşengiya têkoşîna azadiyê ya civakê dike. Li her derê jin bi pêş ve diçin û pêşengiya têkoşînê dikin. Niha bi dirûşma JIN JIYAN AZADÎ li her derê têkoşîna azadî û rizgariyê geş dibe.

Di pêşketina tevgera me û şoreşa Kurdistanê de guhertin û veguhertin, ked û pêşengiya jinê roleke bingehîn lîst. Tevgera me hêz û motîvasyona xwe ji hêza jinê û azweriya jiyana azad digire. Şoreşa Kurdistanê bi reng û pêşengiya jinê bi pêş dikeve. Bêguman bidestxistina vê xisletê ya şoreşa Kurdistanê encama nêzîkatiya Rêber Apo ye. Rêber Apo azadiya jinê xiste navenda têkoşînê, nirxek mezin da jinê, rê li ber rêxistinbûn û vîna jinê vekir. Vê yekê tevgera me û şoreşa Kurdistanê cuda kir, jin bi hêz kir û hêz da. Rêber Apo ji bo pêşxistina hişmendî û têkoşîna azadiya jinê ked û hewldaneke mezin da. Bi nêzîkatiyên bîrdozî û felsefî ku pêşxist, modêl û paradîgmayeke nû ya jiyanê li ser bingeha azadiya jinê pêş xist. Ev keda Rêber Apo îro li hemû cîhanê ji aliyê jinan ve tê dîtin, nirxê didinê û xwedî lê derdikevin. Jin di azadiya fîzîkî ya Rêber Apo de di refên herî pêş de cih digirin û pêşengiya kampanyaya azadiyê dikin. Em vê helwesta jinan gelek watedar, bi nirx dibînin û di vê roja watedar de careke din spasiyên xwe pêşkêşî hemû jinan dikin.

Di Têkoşîna Azadiya Jinên Kurdistanê de ku bandorê li cîhanê kir û bi deh hezaran jin şehîd bûn. Di vê têkoşînê de kesayetên mezin ên rêber û pêşengên weke Sakîne Cansiz-Sara derketin holê, nasname û karakterê têkoşîna azadiya jinê ava kirin. Rêber Apo diyar kir ku têkoşîna azadiya jinê têkoşîna Sakîne-Sara ye. Em di şexsê hevrê Sakîne-Sara de ku di gerdûnîkirina têkoşîna azadiya jinên Kurdistanê de roleke mezin lîst, hemû şehîdên azadiyê yên jin bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin. Em bawer dikin ku heke jin azad bibe, wê civak û jiyan jî azad bibe. Bi vê baweriyê em careke din 8'ê Adarê li hemû jinên cîhanê pîroz dikin, hevgirtina xwe ya bi têkoşîna wan re tînin ziman û serkeftinên mezin ji wan re dixwazin."

# ‘Gelên Rojhilata Navîn li benda çareseriyê ne’

Sekreterê Partiya Roj a Demokrata Kurd li Sûriyê, Kovan Keni`o anî ser ziman ku tevahiya Rojhilata Navîn di rewşeke bê ewle de derbas dibe. Herwiha Keni`o destnîşan kir ku heta guftûgoyên berfireh di navbera hemû aliyên sûrî de çênebe wê aloziya Sûriyê jî bidome.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Weke tê xuyakirin ku di dema dawî de li Rojhilata Navîn şer û pevçûn zêdetir bûne, dosiyaya her dewletekê ji ya din aloztir dibe. Herwiha ji van dewletên ku dikeve bin bandora rewşa dewletên derdora xwe de, dewleta Sûriyê ye. Têkildarî vê rewşa heyî sekreterê Partiya Roj a Demokrata Kurd li Sûriyê Kovan Keni`o bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha ye:

### Çi bandora şerê ku li Rojhilata Navîn diqewime li ser Sûriyê heye?

Li piraniya dewletên Rojhilata Navîn nexweşî û kirîz tên jiyan kirin, edaleta civakî tune ye. Hikumetên desthilatdar yên dewletên Rojhilata Navîn hemû berhemên ku pêwîste ji gel re were pêşkêşkirin, dixin xizmeta hikumetê û hêza xwe ya leşkerî. Di encamê de jî gel birçî dimînin û rastî kirîzeke mezin tên. Herwiha dema ku dewletek rastî kirîzekê tê, ew kirîz bi hesanî nayê bidawîkirin û çareser nabe. Gelek dewletên cîhanê rastî kirîzan hatine lê pirsgirêkên xwe yên hundurîn bi awayekî demokratîk û aştiyane çareser kirine. Lê li herêma Rojhiala Navîn rewş ne wisa ye, hikumet bi awayekî hovane bersiva gelên xwe didin û nelihevkirin di navbera wan de çêdibe. Em îro dibînin piraniya vê herêmê di rewşeke tevlîhev de ye û gelên Rojhilata Navîn di bêaramiyekê de dijîn. Îro gelek hêzên rojavayî weke Amerîka û Hêzên Hevpeymana Navdewletî û hwd… di vê herêmê de hene. Di heman demê de ji ber lihevnekrina gel û hikumetan, van hêzan destwerdan dikir û barên piraniya dewletên Rojhilata Navîn giran kirine. Dewleta Sûriyê jî mîna hemû dewletên Rojhilata Navîn e, ku ji ber siyaseta hikumeta Şamê ev bû zêdetirî 12 sal ku gelên wê di alûziyekî de jiyan dikin. Domdariya vê kirîzê jî ew e ku ne hêzên ku destwerdanê di Sûriyê de dikin û ne hikumeta Şamê ji dilê xwe naxwazin vê kirîzê bi dawî bikin.

### Çima niha hêz û dewletên Rojavayî naxwazin bi tu awayê peywendiyên diblomasî bi hikûmeta Şamê re çêbikin?

Îro hikûmeta Sûriyê di warê rêvebirin û çareserkirina pirsgirêkên gelên Sûriyê ne ew hikûmet xwedî biryar e. Di heman demê de ev hikûmet tu serweriya wê li ser xaka Sûriyê nemaye û gelek hêz serweriya xwe li ser vê xakê didin meşandin. Weke dagirkeriya Tirk, Îran, Rûsya û hwd…, ev yek jî tê wateya ku Sûriye hatiye hilweşandin. Hêzên rojavayî bi rewşa Sûriyê û şerê ku tê de diqewme, dizane. Ev hêz dizanin ku hikûmeta Şamê bûye hikûmeteke şeklî û bêrewa.



Herwiha dizanin ku serê hikûmeta Şamê di tevlîheviyeke pir mezin de ye, nexwedî biryar e û nikare bi tu awayan vê kirîzê bi dawî bike. Lewma di roja îro de hêzên rojavayî di vê rewşa ku hikûmeta Şamê tê re derbas dibe, naxwazin têkiliyên diblomasî bi vê hikûmetê re çêbike. Heta ku hikûmeta Şamê bê biryar e, rewşa Sûriyê wiha tevlîhev e û hêzên cuda yên li ser xaka Sûriyê dimînin, wê tu hêzên rojavayî peywendiyan bi hikûmeta Şamê re çênekin.

### Niha rewşa herêmê bi giştî ber bi kû ve diçe?

Di dema dawî de me dît ku Îran firokên bêajokar û hemû çekên giran dida Hemas, di encamê de jî hemas êrişî Israîlê kir, gelek kesên sivîl û leşkerên israîlî kirin û kuştin. Israîl jî êrişî Filistînê kir û tola xwe ji Hemasê girt herwiha şer û pevçûn di navbera Israyîl û Hemasê de heta roja îro jî berdewam dike. Dewletên weke Amerîka, Ferensa, Elmaniya û Belcîka maf û palpiştiyê dide Israyîlê ku xwe biparêze. Di heman demê de Israyîl naxwaze ku civaka navdewletî jê bixwaze şerê li Filistîn û Israyîl bi dawî bike. Niha jî li herêma Rojhilata Navîn biryaran li gor berjewendiyên xwe digrin. Li Sûriyê ger çareseriyeke siyasî û berfireh pêk newe wê alûzî berdewam bibe. Lewma divê civaka navnetewî, hemû kesên aştîxwaz û aliyên demokrat destwerdanê di çareserkirina alûziya Sûriyê de bikin û bi riya diyalogê bighêjin çareseriyeke siyasî. Herwiha Neteweyên Yekbûyî jî bi rengekî cidî nêzî vê yekê bike û biryara 2254 a ji bo bi dawîkirina Sûriyê pêk bîne. Li aliyekî din em dibînin ku rewşa Îraqê jî ne aram e, ew ji aliyê aborî û leşkerî ve pirsgirêkan jiyan dike. Îro em dibînin ku gelek komên çekdar weke Heşd Elşe`ibî û hwd… ewlehiya Îraqê ber bi nearambûnê ve dibin. Hêzên Hevpeymana Navdewletî û Amerîka bi tirliyonên dolaran li Îraqê weke mesrefa leşkerî dane û ew naxwazin Îraqê bihesanî bixin destê van komên çekdar. Lewma wê Hêzên Hevpeymanî û di serî de Amerîka şerê van komên çekdar bike heta ku wan pûç û bêrewa bike. Li Rojhilata Navîn bi giştî di vê rewşa heyî de, wê hebûna Hêzên Hevpeymana Navdewletî, hêzên rojavayî û hwd… li vê herêmê bidome. Di dawiyê de ger nikaribin pirsgirêkên Rojhilata Navîn çareser bikin jî, wê ev herêm di bin serweriya wan de be.

# CPT hevkara dewleta Tirk a faşîst e

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê ya Konseya Ewropayê (CPT) careke din dirûtiya hêz û rêxistinên navneteweyî yên derbarê rewşa Rêber Abdullah Ocalan û Imraliyê de, derdixe holê. CPT ku qaşo ji bo pêşîgirtina li işkenceya mirovan hatiye damezrandin, li hemberî tecrîda girangirî ya li Îmraliyê xwe bêdeng dike, herwiha bi erk û berpirsyartiyên xwe yên exlaqî ranabe.**

### Danasîn, armanc û dîroka Komîteya Pêşîgirtina Işkenceyê

Komîteya Pêşîgirtina Îşkenceya Meclisa Ewropî li gorî biryara 1’ê ji Hevpeymana EwrOpî ya dijî îşkenceya ku li ser mirovan tê kirin, di Mijdara sala 1989’an de hate damezrandin. Armanc ji avabûna vê komîteyê jî şopandina rewşa kesên ku di zindanan de bêmaf mane û tên îşkencekirin, di heman demê de parastina kesên dîlgirtî ji tundiyan bû. Herwiha Komîteya Pêşîgirtina Îşkenceyê ango bi navê CPT tê naskirin, beşeke bingehîn ji sîstema Ewropayê ya ji bo parastina mafê mirovan. Di heman demê de xebata wê di çarçoveya hemû dewletên ku li ser avabûna desteyê erê kirinetê meşandin.

### Erk û çarçoveya xebata komîteyê

Komîteya Pêşîgirtina Işkenceyê xwedî îmkan û derfeteke berfirehe. Herwiha li gorî madeya 8’an ji hevpeymana Pêşîgirtina Işkenceyê a Meclisa Ewropayê xebatê dide meşandin. Yek ji erkên wê xwegihandina dewletên li derdorê û ji mafê komîteyê ye ku bêsînor li herêmê tevbigere. Divê hemû agahiyên girêdayî cihê kesê dîlgirtî yê ku bêmafmane bizanibe. Herwiha ew mafdar e ku bigihêje cihê zindana ku mirov tê de hatiye dîlgirtin. Di heman demê de derfetê dide kesê dîlgirtî ku hevdîtnan çêbike. Li aliyekî din Komîteya Pêşîgitrina Îşkenceyê bi rêxistinkarî her demeke destnîşankirî serdana zindan û deverên ku mirov lê hatine girtin, dike. Li gorî madeya 7’an jî ger ku were xwestin dikare bi awayekî taybet an jî ji nişka ve serdanên xwe pêk bîne û dikare alîkariyê ji kesên bispor û bijîşkan bixwaze. Herwiha ji dema ku ev komîte ava bûye heta sala 2012’an 334 caran serdan çêkiriye.

### Erkê Komîteya Pêşîgirtina Îşkenceyê yê zagonî

Erkê Komîteya Pêşîgirtina Êşkenceyê ya Meclisa Ewropa(CPT) karekî xwedî girîngiyeke mezin e û divê hemû aliyên ev hevpeyman îmze kirine li gor erka vê desteyê di rewşê aramî, şer, rewşên awarte û hwd… de bimeşin. Di rewşên wiha de jî, piştî Desteya Xaça Sor erkê wê dikeve asta duym de. Di şer û pevçûnan de xalên hevpeymana Cinêvê ya 1949’an, du pirotokolên sala 1977’an û madeya 3 heta 17’an ji Komîteya Pêşîgirtina Işkenceya tên pêkanîn. Ev made û hevpeyman bi tevahî tekez dikin ku çênabe komîte derbasî deverên ku nûnerên dewleta ku şer lê diqewime û Xaça Sor serdana wan kiribin, bibe.


### Bêdengiya CPT li hember daxwaz û nameyên parêzerên dîlgirtiyên Îmralî

Komîteya Pêşîgirtina Îşkenceyê di sala 2022’an de di derbarê serdana xwe ya ku ji Îmraliyê raporek amade kir. Herwiha di sala 2023’an ev rapora girêdayî rewşa Rêber Apo radestî hikumeta dewleta Tirk a faşist kir, lê heta niha ev rapor ji aliyê CPT û faşista Tirkiyê nehatiye xwendin û rewşa Rêber Apo nehatiye zanîn. Biroya sedsalê a Parêzerî ji bo vê raporê jî bi dirêjahiya sala 2023’an 4 caran name ji komîteyê re şandiye. Herwiha di nameyên ku hatin şiyandin de rewşa Rêber Apo, tecrîda giran û binpêkirina dewleta Tirk ji mafê kesên dîlgirtî re hat şîrovekirin. Lê Komîteya Pêşîgirtina Îşkenceya Meclisa Ewropî bersiva nameyên Nivîsgeha Eesrîn(Biroya sedsalî) neda û hemû name hatin piştguhkirin. Nivîsgeha Esrîn ya Parêzvaniyê û parêzerên Rêber Apo ji Mijdara 2023’an heta çileya CPT di navbera 13-22’ê Sibata 2024’an de ji bo vekolana pêkanînên li ser kesên di girtîgehên ewlekariya bilind de tên kirin, serdana dewleta Tirk a faşist kir. Lê di encamê de CPT bêyî ku serdana Îmraliyê bike vegeriya. Piştî ku erdheja 6 Sibata 2023’an a mezin û yên bi şûnde, herî dawî erdheja ku di 23’ê Sibatê de li nêzî Îmraliyê çêbû, divabû ku parêzer an jî kesayatek ji malbatê hevdîtinekê bi Rêber Apo re çêbikin. Li gor madeya 5275’an a dewleta Tirkî ger rûdaneke xwezayî li Tirkiyê çêbibe ji mafê kesê dîlgirtî hevdîtinan bi malbatê û parêzeran re çêbikin. Lê dewleta Tirk a faşist ne li gorî vê biryarê tevdigere. Di heman demê de CPT jî destwerdanê ji bo hewldana diyarkirina rewşa Rêber Apo nake.

### Hevdîtinên Rêber Apo û girtiyên li Îmraliyê

Rêber Apo ji 20’ê Adara sala 2021’ê ve tu agahî jê nayê girtin, dewleta Tirk a faşist nahêle ne parêzer û ne jî malbata wî hevdîtenkê pêre çêbikin. Parêzerên Nivîsgeha Esrîn diyar kirin ku Rêber Abdullah Ocalan di nava 12 sal û nîvan de tenê 5 caran bi parêzeran re hevdîtin kiriye û ji sala 2014’an û vir ve tenê 5 caran bi malbata xwe re hevdîtin pêk aniye. Di sala 2019’an de jî ji 3’ê Adara 2020’an û vir ve hevdîtina bi malbatê re jî hate qedexekirin. Parêzeran dan diyarkirin ku Umer Xeyrî Kunar, Hamîlî Yildirim û Weysî Aktaş ên li Îmraliyê jî girtî ne, gotin. “Ji destpêka sala 2015’an û vir ve muwekîlên wan nikarin bi parêzerên xwe re hevdîtinê pêk bînin û di nava 7 salan de Omer Xeyrî Konar û Weysî Aktaş 3 caran hevdîtin pêk anîne. Hamîlî Yildirim tenê bi malbata xwe re du caran bi malbata xwe re hevdîtin pêk aniye û ji roja 03.03.2020ê heya niha ti mafê hevdîtinê ji malbatan re nehatiye dayîn. Weke em dizanin ku dewleta Tirk a faştist û hêzên komploger girava Îmraliyê ji bo kesên azadîxwaz kirine zindaneke herî xerab. Ev bû zêdetirî 3 salan ku gelê kurd û gelên azadîxwaz yên cîhanê agahiyan têkildarî rewşa Rêber Apo nas nakin. Li gor ku CPT xwe di vî warî de bêdeng dike û tu agahiyan li ser tendurstiya Rêberê Gelê Kurd eşkere nake, êdî dibe tevkara tecrîda li ser Rêber Apo. Di heman demê de zagonên mirovan yê cîhanî binpê dike û ne li gor armanca ku ji ber wê hatibû damezrandin xebatê dike.

## Hefteya Qehremeniyê



**Ahmet Aktaş**

Di têkoşîna Tevgêra Azadiya Kurdistanê de, cihê vê Hefteyê, pir giring e û rolek pêşengî hildaye ser milê xwe.
Wateya vê hefteyê, dema navbêna çalakî û şehadeta Mazlum Dogan û Mahsum Korkmaz e.
Mazlum, di 21’ê Adara 1982an de, di zîndana Amedê de, bi çalakiya canbexşane, bû pêşeng û ruhê hêza berxwedana zîndanan.
Mahsum, di 28’ê Adara 1986an de li çiyayê Gebarê şehîd ket, belê bi pêngava 15’ê Tebaxê û çalakiyên corbecor, bû fermandar û curetê berxwedana gerîlayan.
Ji ber ku her du jî, him di heman heyva Adarê de şehîd ketin, him jî ji ber naverok, wate û giringiya çalakî û rola wan a pêşengtiyê di şorêşê de, ew dema navbera çalakî û şehadeta wan a 21 û 28an, ji aliyê rêveberiya Tevgera Azadiyê ve, weke hefteya lehengî hat pejirandin û ragihandin.
Bi kurtayî mirov dikare giringî û wateya vê hefteyê wisa şîrove bike:
Çaxê ku Mazlum, çalakiya xwe ya canbexşane li dar xist, derbeya faşîst a 12’ê îlonê pêkahitibû, him li derve û him bi taybetî li zîndanan bi êşkenceya wahşî xiyanet li ser girtiyan ferz dikir.
Mezlum, li himber vê êrîşa qirker a dewleta tirk, serî hilda, demek dirêj berxweda û yekane çare di çalakiya canbexşî de dît.
Mazlum, him 21’ê Adarê bi zanebûn hilbijartibû, him jî êdî gihiştibû wê hişmendiyê; heke çalakiyek wisa nebe, nikare wê siyaseta kurdkuj bişkîne û nikare hevalên xwe ji bin wê bandora faşîst a xiyanetê rizgar bike, tirsa li ser wan bişkîne, şûna wê cesaret biçîne û hwd.
Piştî çalakiyê, pêşbîniya wî rast derket, hevalên wî rabûn piya û rêze çalakî destpêkirin; çalakiya çaran a Ferhat, Mahmut, Eşref û Necmi, û çalakiya 14’ê Tîrmehê ya Xeyri, Kemal, Akif û Elî!
Weke gotina zîndaniyan, çalakiyên wan “dîwarên zîndanan qelişandin” û peyama xwe gihand Rêber û hevalên xwe yên derve.
Bêguman mîna destpêkê, li vê qanoxê jî peywira giran ket ser milê Rêber Apo!
Wî jî, ev peyam hilda û li ser vî ruhê şoreşgerî, hevalên xwe perwerde kir û şandin qadên berxwedanê.
Yek ji pêşeng û fermandarê vê qonaxa nuh Mahsûm bû û pêngava 15’ê Tebaxa 1984an, bi serkeftî pêkanî û bi vî awayî, pira şoreşê ya navbera zîndanan û derve ava kir.
Nuha şoreşa Kurdistanê di qonaxa avakirina pergala Xweseriya Demokratîk de ye.
Herwiha divê neyê jibîr kirin, di vê qonaxê de rola pêşengiya bîrdoziya jinê her li pêş e û jixwe di 8’ê Adaran de jî, divê ruhê Sakineyan her li bîra me be!
Piştî ewqas salan, Rêbar Apo dîl hat girtin û zîndaniya wî ket sala 26an.
Mîna li derve û zêdetir, li zîndanê jî erk û peywirê xwe yên rêberiyê ewqas sal in bê qusûr dide meşandin. Êdî ji şopdarên wan çi tên xwestin, gelek zelal e û divê herkes bi berpirsiyariya xwe ya hevaltî, niştimanperwerî û mirovahî rabe!
Di ew şerd û mercên giran û bêderfet de wan ewçend rûmet û derfet afirandin, ma gelo di van şerd û mercên evçend bi derfet de, çima em rawestin?
Êdî xemsarî nayê qebûl kirin, divê herkes çalak be!



# Pêşxistina xebatên şaredariyê valaderxistina armancên DAIŞ`ê ye

Di 11`ê Adara 2014`an de çeteyên DAIŞ`ê êrişek hovane li dijî Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo pêk anî, di encamê de 10 xebatkar û lêvegerên li şaredariyê şehîd bûn. Şahidê buyerê Cemal Xelo diyar kir ku armanca DAIŞ`ê têkbirina destkeftiyên şoreşê bû.

**Navenda nûçeyan**

Bi li darxistina Şoreşa Rojava re şaredarî jî hatin avakirin. Wê demê şaredarî li herêmê saziyên sereke bûn ku gel bi rêxistin dikirin û pirsgirêkên wan çareser dikirin. Di nava Şaredariyê de hemû pêkhate ji Kurd, Ereb û Suryan lê dixebitîn. Lewra destkeftiyên şoreşê ji bi xebatên Şaredariyên gel hatin destpêkirin, ji ber vê yekê 11 Adara 2014`an de çeteyên DAIŞ`ê êrişê Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo kir û di encamê de 10 xebatkar û lêvegerên li şaredariyê şehîd bûn.

### Çeteyên DAIŞ`ê komkujî di Şaredariya Gel de pêk anî

Di dema ku şaredarî rastî êrişa çeteyên DAIŞ`ê hat, hêzên parastinê lê tine bû, ji ber ku nû hatibû avakirin. Lewra çeteyan bi hêsanî derbasî avahiya bûn. Êriş di saet 12` nîvro de çebû. Di wê saetê de şaredarî bê deng bû, berî ku çete debas bibin, çavdêrê li ber derî şehîd xistin. Piştre derbasî şaredariyê bûn. Dema derbas dibin kedkarê ku bi navê Fehed Ebdulezîz xwe dide pêşiya wan da ku wan bigre, çeteyek xwe diteqîne û Fehed şehîd dikeve û çeteyan komkujî pêk anîn, bi çekan xebatkarên şaredariyê kirin hedef, bombe avêtin odeyan û mayînên li ser xwe teqandin. Di vê êrişa hovane de, Îbrahîm Ezîz ku di avakirina Şaredariya Qamişloyê de xwedî kedeke mezin bû, Rewşen Mihemed Zekî, Fehed Ebdulezîz, Mûsa Azad Mûsa, Elî Bora, Cîhan Mûrad, Emîna Bîlal, Ferhad Ebdulezîz Osman, Elaedîn Ebdulîllah, Awaz Mehmûd Mihemed û Helebçe Xelîl ku ducanî bû, şehîd bûn.

### Domdandina xebatên Şaredariyê valaderxistina armancên DAIŞ`ê ye

Piştî buyera ku ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê li ser Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo pêk hat, kar û xebatên xwe neda rawestandin, bêtirî xwe bi domandina kar û xebatên xwe armanca êrişê têk bir û peyama xwe da. Niha jî şaredariyên gel li her bajarê hene û bi awayekî baş ji bo civaka xwe kar û xebatê dide meşandin. Ji bo wê jî ev êriş armanc û îradeya xebatkarên şaredariyê hem jî yên gelê li herêmê neşikand.

### Armanca DAIŞ`ê têkbirina Rêveberiya Xweser bû

Di dema ku êriş li ser Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo pêk hat, Rêveberiya Xweser nû hatibû ragihandin, lewra çeteyên DAIŞ`ê dixwest bi rêya êrişên xwe rêveberiyê bişkînin û nehêlin kar û xebata wê dewam bike. Ev Rêveberî ji bo gelê Kurd û gelên herêmê gaveke dîrokî bû. Êrişa li ser Şaredariya Qamişloyê jî piştî ragihandina Rêveberiya Xweser bû. Armanca komkujiyê jî zelal bû, ji bo ku bawerî li herêmê nemîne, herwiha tirsê bike nava gel û destketiyên gel têk bibin. lê armanca wan pêk nehat.
Derbarê êrişa çeteyên DAIŞ`ê ya di sala 2014`an de li ser Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo pêk hat Rêveberê Ofîsa Têliyên Gel Cemal Xelo ku şahidê bûyerê bû ji rojnameya me re axivî.
Cemal Xelo diyar kir ku ew yek ji damezrînerê Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo bû û wiha got: “Ez yek ji damezrînerê Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo bûm ku min di sala 2011`an ve cihê xwe di nava Şaredariyê de digirt. Di roja ku êrişa çeteyên DAIŞ`ê li ser şaredariyê pêk hat, di betlaneyê de bûm, lê di wê rojê de ez çûm Şaredariyê ji ber ku karekî min lê hebû. Dema ku giştim nêzî şaredariyê min dît ku 2 kes li rastî deriyê şaredariyê pevçûn di navbera wan de hebû, di heman kêliyê de 2 kesên din ji aliyê cûda ve derbasî hundirê Şaredariyê bûn û teqîn ji aliyê wan de pêk hat.”

### ‘Piştî teqînê 2 çeteyên din hatin girtin’

Cemal Xelo da eşkerekirin ku xebatkarên di hundirê şaredariyê de asê mabûn hatin şehîdxistin û wiha got: “Min bi xwe jî alîkarî kir, piştî ku teqîn çêbû min 2 kes jî di hundirê şaredariyê de girt, yek jî bi cilê sporê û yê din jî bi kiras bû, min ew radestî Hêzên Ewle-



kariya Hundirîn kirin. Herwiha gelek xebatkarên ku di hundirê şaredariyê de asê bibûn şehîd bûn, yên derketibûn li ser belkona Şaredariyê bi riya gel û Hêza Ewlekariya Hundirîn hatin ew rêzgarkirin.”
‘Dewleta Tirk a dagirker piştgirya DAIŞ`ê dike’
Rêveberê Ofîsa Têliyên Gel Cemal Xelo axaftina xwe wiha qedand: “Çeteyên DAIŞ`ê bi van êrişên hovane dixwest vîna gel bide şikandin, di heman demê de, ji ber destpêkirina pirojeya Rêveberiya Xweser jî bû, xwest ev piroje neyê domandin û têk biçe. Ji xwe DAIŞ`ê destekê ji aliyê dewleta Tirk a dagiker ve digire, herwiha piştî êrişa şaredariyê jî gelek êrişên din bi vî rengî ji aliyê DAIŞ`ê bi pêşengiya dewleta Tirk a dagirker ve pêk hat û heta niha jî êrişên xwe didomînin, lê Şaredarî ti çarî hêza xwe neda şikandin û xebatên xwe neda rawestandin, bêtirî wê ji bo tolhildana xebatkarê şehîdên xwe, xebatên serkeftî ji bo xizmeta civaka xwe pêk anîn û berdewamî dan xebatên xwe.”

# Qutkirina avê, qutkirina jiyanê ye

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan a Kantona Cizîrê Evîn Cuma bang li hemû kesen pêwendîdar kir ku biryarên bi vî rengî ji nû ve li ber çavan re derbas bikin û zextê li UNICEF bikin da ku erkên xwe yên exlaqî û qanûnî li hember vî gelî pêk bîne.**

Piştî derbasbûna 6 salan ji koçberkirina bi darê zorê ya gelên Efrînê ji herêmên xwe ber bi herêma Şehba ve, gel di warê madî û manewî de, li hemberî dijminê hov hê jî berdelên giran didin. Ev gelê dilsoz bi sekin û têkoşîn, tevî hemû êş û karesatan li ber xwe da. Her wiha ji ber biryara UNICEF’ê ya qutkirina avê li ser gel yên li kampan, sûceke pir mezine. Ev biryar tenê tişta ku dewleta Tirk a faşîst bi qutkirina avê li ser gelê Şehbayê û Hesekê pêk anî, biryara UNICEF’ê jî piştgirî dide van polîtîkayan. Di vê çarçoveyê de Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan a Kantona Cizîrê Evîn Cuma ji Rojnemeya me re axivî.

### ‘Şeheba, ji 2 aliyan ve tê dorpêçkirin’

Evîn Cuma balkişand li ser dorpêç û êrişên dagirkeriya Tirk li ser Şehebayê û wiha got: “Ji dema dagirkirna Efrînê û heya roja îro, herêma Şehebayê rastî dorpêç û êrişan tê. Bi taybet welatiyên



ku ji Efrînê koçber bûne, hijmaran wan bi sed hazaran ne, her wiha nêzî 100 hezar kes jî li gund û kampên Şehebayê xwe bi cih kirin û bi zehmetiyên pir mezin re rû bi rû dimînin. Şehba ji 2 aliyan ve tê dorpêçkirin, yek ji aliyê hikûmeta Şamê ve ya din jî ji aliyê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ve. Di encamê vê de, zehmetî û astengiyên pir mezin li ser koçberan tê meşandin, wek tune bûne avê, elektirîk û jêderên enerjiyê, ji bo meselaye serma û germahiyê jiyaneke pir zor û zehmet digihîje wan û her tişt li ser wan hatiya qutkirin. Her wiha bazareke siyasî li ser wan tê kirin ku her dewletek li gor berjewandiyê xwe tevdigere û jiyan dikin. Rêveberiya Xweser jî heya astekî dibe alîkar, lê ji bo dorpêçkirinê, zehemetiya dibîne û nikare xwe bighîjêne wan ku bi rehetî bibe alîkar bi Koçberên Efrînê re.”

### ‘Li gor zagonên Navnetewî ev şerekî dijî mirovahiyê ye’

Evîn di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Di sala borî da, buyera erdhêja ku li Şehebayê hat qewmandin, gelek zerarên madî li heremê çebûn li ser vê bingihê tu alîkarî nehat kirin ji bo van kesên ku di erdhêjê de zerar dîtin, bi vê jî rewşa wan hîn zêdetir ber bi zehmetiyê re derbas bû. Di heman demê de êrişên ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker li ser Şehebayê tê kirin her berdewame û bi rengekî hovane roja ne êriş xwe didomîne, ev jî dibe sedem ku gelek sivîl jiyana xwe ji dest didin û birîndar dikevin. Ji aliyê qanûnî de, gel ber bi qirkirinê de dibin ku ji hemû aliyan dorpeç li ser gelê Şehebayê tê kirin, qutkirna avê, hem jî derman û xwarin li ser hatiya qutkirin. Li gor zagonên Navnetewî ev şerekî dijî mirovahiyê ye.”

### ‘Raporên sûcên ku li Efrînê û Şehebayê tên kirin hatina hazir kirin’

Evîn da zanîn ku Komeleya Mafê Mirovan a Cizîrê û Efrînê belgekirina binpêkirina ku li Efrînê tê kirin hatin derxistin û got: “Karekî belgekirinê hat hazir kirin, her wiha gelek konferans û form hatin li darxistin ji bo van sûcên ku li Efrîn û Şeheba tên kirin ji aliyê qanûnî de. Di encamê de qumîte derketin ji bo şopandina van binpêkirina, her wiha niha jî hazir kirina dosiyayên tenê li pêşiya dadigihên Navnetewî û Avrûpî derbarê van binpêkirina hatina hazir kirin. Zehmetî ewe ku em nikarin derbasî Efrînê bibin da ku em delîlên van sûcan bînin, tenê ew kesên ku ji Efrînê xilas dibin û dibin şahidê van sûcan.”

### ‘Jiyana gel kirina xeteriyê de’

Rêveberiya Komeleya Mafê Mirovan a Kantona Cizîrê Evîn Cuma di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Em wekî Komeleya Mafê Mirovan, şopandina ev sûcên ku tên kirin, em dikin. Gelek rapor û dosiya yên taybet li ser qutkirina avê li ser Şehbayê û Kampên wê, ji ber ku dewleta Tirk a dagirker çemên avê yên ku dihat Suriyê, da qutkirin. Ev pirsgirêkek pir mezin li suriyê derxistiye û bi taybet ev herêmên dorpêç li ser heye. Li Şehbayê ew alîkariya ku dihat kirin ji aliyê avê de, ew jî hat sekinandin û av bi zehmete ku were peyda kirin. Jiyana gel kirine xeteriyê de û ev jî tê maneya ku hebûna gelê kurd were tune kirin. Wek tê gotin kantona Şehbayê û navçeyên wê ji aliyê dewletên Navnetewî de nehatiya nasîn, ji ber vê sedemê tu alîkarî ji koçberan re nayên kirin, gelê Efrînê bi darê zorê ji mal û erdên xwe derketin, ev Rêxistinên Mafên Mirovan nabînin ku ev gel li çolan û kampan mane û çi zehmetî dibînin. Ev jî destgirtina hevcekariya dewleta Tirk a dagirkere, yanî ev Rêxistinên Mafên Mirovan tê wateya ku tenê parastina dewletan û berjewandiyê wane, ne ji bo parastina mirovan e. banga me ji bo alîkariya koçberên li Şehbayê û parastina wan ji qirkirina ku li ser wan tê kirin, her wiha ku av ji bo wan were peyda kirin û Rêxistinên Mafên Mirovan û hemî saziyên Navnetewî ku bi erkên xwe yên exlaqî ve rabin.”

## FENER

## Têkoşîna jina Kurd çavkaniya azadiya jinên cîhanê ye



**Idrîs Henan**

Çawa dibe 8’ê Adarê, tavilê têkoşîna jina Kurd a xwedî hişmendiya pêkvejiyanê tê bîra mirovan. Jina Kurd a ku pala ezmûna xwe daye felsefeya Rêber Apo, ji hemû dunyayê re bûye çavkaniya wekhevî, edalet û serkeftinê. Ev yek jî bi saya ramanên Rêber Abdulah Ocalan ku jin ji bin nîrê hişmendiya desthilatdariya zilamperest xilas kiriye û bi baweriya ku jin dikare paralelî mêr, hemû aliyên jiyanê bi rê ve bibe pêkan bûye. Tabî ne birêvebirineke xwe spartiye elimandinên dewletparêz, lê li ser bingeha xweseriyeke demokratîk a hevbeşbûna jiyanê ye.
Nêrîna li ser pêşengiya jina Kurd ji têkoşîna azadiyê re, êdî li dunyayê hevbeş bûye û kesek nikare tecrûbeya têkoşîna Kurd li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û herêmê bi giştî, derveyî vê pêşengtiyê binirxîne. Çendîn nirxandinên dixwazin keda jinê desteser bikin hebin, dîsa jî nikarin destkeftiyên bi pêşengtiya jinê bi dest ketine ji nedîtî ve bikin. Lewe re, li hemû dunyayê weke tecrûbeya kêmdîtî ya bê mînak û bê hempa têye nirxandin. Ev yek jî gelek eşekere bi wergerandina ramanên Rêber Ocalan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe daye der ku li ser bingeha şoreşa azadî, demokrasî û wekheviyê ava bûye.
Di bingeha şoreşa ku jin pêşenga wê ye de, ne tenê destkeftî hene, lê belê mekanîzmaya pêşxistin û birêkûpêkirina van destkeftiyan jî heye. Ev yek jî siya xwe avêtiye hemû beşên civakî yên siyasî, aborî, leşkerî, ewlehî û dîplomasî û bi rêxistinbûyîna xwe, bi şiklên cuda cuda yên xweser re teşe li ser erdê girtiye. Îroj jî jin di bin sîwana wan teşeyên xweser de dicivin bê ku guh bidin cudahiyên olî, rêolî û etnîkî; tenê li ser hêmana Netewa Demokrtîk dicivin.
Bê guman fikra Rêber Apo bandoreke mezin li dewlemendkirina fikrên jinan û xurtkirina rêxistinên wan ên çalak dike. Taybet jî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku azadiya jinê, wekhevî û jiyana hevbeş li wir ava dibe. Li vê herêmê, jinan bi saya fikrên Rêber Apo gavek mezin di têkoşîna xwerizgarkirina ji şîdeta sermayedar û çewsandinê avêtine. Bi van metodên têkoşîna azadî û demokrasiyê re, ji malbatê bigire heya zihniyeta mêrparêz a ku civakê bi rê ve dibe, xwe xilas dike û bi têkoşîna xwe, ji nû ve teşeya jina azad a xwedawend ava dike û jiyanê li ser bingeha hevbeşiya herdû cinsan dadimezirîne. Ev yek jî ancax bi rêveberiya jina dayîk a ku Me`yên wê hatibûn desteserkirin, ji nû ve, di cokên jiyana xwezayî de biherike.
Ji ber vê xisûsa têkoşîna xwe spartiya fikrên Rêber APO, terora DAIŞ’ê û êrişên dagirkeriyê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi serperştiya jinê hatin têkbirin. Ev yek jî isbat dike ku dunyaya sermayedar nikara şewqa heqîqetê bi bêjinga desthilatdariyê xwe veşêre. Ji ber vê jî, tecrûbeya jina Kurd, li cîhanê bûya çavkaniya îlhamê û veguheriye paradîgmaya têkoşîn û parastina nirxên mirovahiyê.
Îroj, tevayî cîhan, dema ku dibêjin 8’ê Adarê, jina Kurd tê bîra wan. Ev roja ku bi keda jinê hatiye van kêliyan, bi têkoşîna jina Kurd a li dora fikrê Rêber Apo mezin bûye, bi wate, naverok, cilûberg bûye.